LI MEKKEHÊ KEÇEK KURD YA ENFALKIRÎ DIHÊ DÎTIN

ELî Bendî
Alişbandii@yahoo. com

Piştî jinavçûna rijêmê Be´s yê Efleqî û azadkirina gişt Îraqê ji dektatoriyê, roj na borin, tawan û nihêniyên wî rijêmî û hevalbendên wî nehên aşkerakirin û çarenivîsê bêserûşûnên enfalkirî nehê diyarkirin.

Li Mekkeha pîroz ku mala Xwedê ye û salane bi melyonehan mosilman ji herçar qurnetên cîhanê qestê dikin û Qurana pîroz il ser wê axa pîroz hatiye xwarê, keçek kurd ya bêgunneh ku di hewên enfalan de hatiye werpêçan, piştî raborîna (15) panzdeh salan çarenivîsê wê dihêt aşkerakirin.

Hacî Şewket Rif´et jîdarek kurd e û xelkê devera Xaneqîn e, li sala 2002-ê qesta Mekkeha pîroz dike bo edakirina Hecê lê, ji nîşkekê ve hevwelatiyek ereb lê diteşqile û pirsyar dike: erê tu kurd î? Hacî Şewket lê vedigêre û dibêje: belê ez kurd im, kerem bike! Yê ereb dibêje: xêzana min jî kurd e, ez xelkê Erebistana Se´ûdiyê me, min divê çendekê li gel êkdu biaxivin.

Hacî Şewket dibêje ku wî kabirayî ez li gel xwe birim bo avahiyek çend qatî li Mekkehê û pêkve rûniştin û bo min da xuyakirin ku ew bi xwe xelkê devera Necdê ye.

Hacî Şewket di dîdara xwe

de bo rojnameya Emro jimare (37) li rûpelê 2-yê pêde diçe û dibêje: piştî ku demekê em axivtîn, hîna kabirayê ereb ku navê wî (Îsmayil Ebdilrehman e), gazî kir xêzana xwe ya kurd û destûr da ku bihê jor, bi zimanê erebî got (Um Mihemed) were, li gel gaziya wî xêzana wî bi jor dikeve, poşiyek reş ya erebî li ser demê wê bû, tenê çavên wê diyar bûn, jiyê wê nêzîkî (35) salan bû, min bi germî silava wê wergirt.. hevjînê wê, kabirayê ereb, got filan kes wê poşiya reş ji ser dêmê xwe rabike! Bo zanîn li Erebistana Se´ûdiyê nabe ku serûçavên afretan li beramber zilaman kifş bibin bi taybet yên biyanî belê kabirayî destûr da hevjîna xwe ya kurd ku wê poşiya erebî bihavêje da ku ew û Hacî Şewket li gel hev biaxivin. Kabirayê Se´ûdî got min (Hacî Şewketî) tu xelkê kûderê yî, min lê vegerand û got ku ez xelkê Xaneqînê me. Got erê tu kurdî dizanî? Min got belê dizanim!

Li gel vê kurt e hevpeyvînê afret bişkurî û bi kurdî li gel Hacî Şewketî axivt. Hacî got keça min tu xelka kûderê yî? Wê got ez ji kesanên enfalkirî me, demê em hatîn enfalkirin û hînayin ser sînorê Seûdiyê, pirraniya kesanên li gel me ji layê serbazên Îraqê ve hatin kujtin belê, me çend kesan (sê keç û çar kurr), giyanê xwe xist di metirsiyê de û bi çi halê heyî me xwe ji nav komên mirovên ku bi kom hatîn kujtin derbaz kir û me xwe gehand gundekê li ser sinorî. Nêzîkî salekê em li wî gundî man û xelkê gundî em xwedan kirin. Paşî, Ebu Mihemed ji bo seredana xizm û kesûkarên xwe qesta wî gundî dike, li wê derê bi ser me hil dibe, çavên wî bi min ketin û serpêhatiya me zanî, daxwaz ji min kir ez şû pê bikim û ji ber wî serûberê ku ez tê de êkrast razî bûm û min şû pê kir... !

Hacî Şewket di axivtina xwe de dibêje: min daxwaz jê kir ku piştî çend rojên din ez dê bivegerim mal û eger nameyek hebe bo kes û karên wê ez dê

bigehînim belê wê got nexêr min çu name nînin, çunkî berî du salan hindek ji xizm û kesûkarên min qesta Mekkehê kirin û me hevdu dît. Paşî got ku ez xelka gundên dewrûberên Derbendîxanê me. Û hêvî ji min kir ku wan nihêniyan biparêzim ji tirsa (muxabiratên) Îraqê de çunke berdewam li Se´ûdiyê hene bi taybet li Mekkehê. Hacî Şewket dibêje, min got wê keça min ez dê biçim dayka xwe bihînim da ku ew jî te bibîne, belê, ew qayil nebû j ber ku gelek ditirsiya bi taybet ji mêrê xwe kabirayê Se´ûdî. Min gotê kiça min bo min bibêje ka çawan rizgar bû, hîna got: demê em hînayin gundekê Îraqê li ser sînorî, çalên kûr û dirêj, berwext kolabûn, mirov bi saxî kirine tê de, kom bi kom, gullebaran kirin û ax radan ser, hinek dimirin, hindek bi saxî, hindek jî birîndarî binax kirin, ji wan jî dayk û bav û birayekê min.. li pêş çavên min ew kujtin û ax radan ser, ez û du keçên din bi alîkariya çar gencên ku li gel me rizgar bûyin, me karî bo demekê xwe biveşêrin û paşî, bi rêka qaçaxçiyên ku bazirganiya mer û malatî dikin, em derbaz bûn Se´ûdiyê, bêhtir ji sê salan ez bi kurdî ne axivtime û zelamê min jî nahêle ku zarokên min bi kurdî biaxivin...!

Hacî Şewket dibêje ez gelek mam pêve ku bizivire Kurdistanê lê wê got ku çi kesên min ne mane, hemû hatin kujtin û birandin, tenê ez ya mayim, ev der e bo min baştir e, zilamê min li gel min baş e. Wê weha got herçende zelamê wê got ku ji layê wî ve ew razî ye eger xanim bizivire welatê xwe belê wesa diyar bû ku wê